
## Nûçe û Çalakî Nûçe û Çalakî

### Osmanê Dadeliyê çû ser dolovaniya xwe



Osman Hacî Silêman, di sala 1946 an de, li gundê Dadeliyê, herêma Kobaiyê, ji dayîk dibe.Di sala 1991 an de, ji hêla dilxwazên P.K.K ve, li gora helbijartinên encûmana Sûriyê dibe endamê Perlemanê. Osman , di nav êl û eşîrên Kobaniyê de, xwedî rûmet bû. Osman sê caran ( 1995-2002-2005) hatiye girtin û berdan.Û di 27-11-2007 an de, careke din tê girtin. Di 22-01-2008 an de, ji hêla esayêşan ve, bi dizî û di bin navekî ne nas de- **Ehmed El-elî-** dike ve nexwaşxana El-kindî. Piştî hêvî jê tê birîn, xwediyan agahdardikin û wî berdidin. Xwedî wî di nexwaşxana El-eşrefiyê û Martînî de derman dikin. Di şeva 19- 2-2008 an, di nexwaşxana Martînî de, jiyana xwe ji dest da û di 20 an de, bi beşdariya bi hezaran xwedî û berketiyên Osmên li gundê Dadeliyê tê veşartin.

Bi navê komît û xwendevanên Newrozê, em serê xwedî û berketiyên wî saxdikin.

### Komcivînên Rêxistinî

Ji bo pêşxistina rewşa rêxistinî ya partiya me, komîta herêmê ya taxa Eşrefiyê, Çend şevên rêxistinî li dar xist. Hevalan, tiliyên xwe danîn ser kêmkasî û newaşyiên heyî û taybet, Wek tengasiya rewşa aborî, civakî û . siyasî ya gelê Sûriyê û bi gotin û pêşinyarên xwe hevalan ew şev têrkirin û xemilandin

### Du xewndekar Hatin Giritn

Di 21-2-2008 an de , li zanîgeha Heleb, du xewndekar( Cîgerxwîn Mile Ehmed Mîkanîk sal 2 û Ehmed Yûsif-Edeb-Erebî sal3 ji hêla hêzên ewlekariyê ve hatin girtin.Û di 25 an de Cîger tête berdan û yê din jî hê girtî ye. Bi navê komîta rêvebir ya weşana Newrozê, van ton girtinan şermezar dikin û doza berdana yê girtî dikin.

## Efrîn ji Dêrê vedixwe

Li 23.2.2008 an , roja Şemiyê , li lîstgeha Hemedaniyê li Heleb , tîpa Efrînê ya werzişê bi Ya Fitiwê re raberîdaneke fotbolê ( gokê ) lîst . Di encam de , Efrînê( 3 bi 2 ) Golan ji Dêrê vexwar

### PÎROZ BE

Li vê dawiyê, Tîpa werzêşê ya Cîhad a taxa Eşrefiyê Heleb, bi panzde giropên lîstgoyê, lîstin. Li encama lîstikê, herdu girop, El-cîhad û El-reca man. Di navbera wan de, bi beşdariya komek ji xortan, tîpa El-cîhad bi encama 3/2 golan bi ser ket.

Li dawiyê Werzêş û cansivikî armanca xortan e û serkeftin ji tîpa El-cîhad re.

### Pîrozbahî

**Bi hatina cejna jinan û Newrozê, em baxek gulên rengîn diyarî jin, dayîk , gelan û bi taybetî gelê xwe yê Kurd dikin.**

www.arsivakurdi.org

# NA
# Ji êrişa leşkerên Turkiyê re

**- Dilsozê Dozê -**

**Ji** roja Pêncşemê 21 .2.2008 ve , leşkerê Turkiyê dest bi êrişeke çolî giran li Bakurî Kurdistana Îraqê , li dijî cîgehê P.K.K - wek dibêje – kiriye û hîn jî berdewam e . Bêyî , ku tu rêzê ji sînorên navdewletî û yekîtî û serbestiya dewleta Îraqê re bike . Di encama vê êrişê de , ta roja 24.2 an , li gor agahiyan bi dehan ji herdu aliyan hatine kuştin û birîndarkirin , balefirek Turkiyê hatî xar , û hinde ziyanên ji vir û wir gihaye xelkê herêmê . Hêjaye em di vê derbarê de , helwestên derketine bidin xuyan . Emerîka û Îraqa federal ta dema nivîsandina vê daxuyanê çav damrandibûn. Bi ser ku , parastina her bostek ax ji Îraqê stubariya wan herduwan e . Yekîtiya Ewropa li ser zimanê Xafiyêr Solane , Birêtaniya weke dewletek serbixwe , û Ban Kîmon nerazîbûn û rikberiya xwe ji vê êrişê re dan xuyan . Û dibînin ku , ev êriş ne li gor zagona dewletan e , û rêderçûn e . Rûsiya , Sîn , dewletên Misilman , …….û H.W.D , bêdeng in . Zatirê dewletên Ereb û Îranê bi vê şan e .

Tiştê em dibînin ev êriş ne li gor û li yaqî gef û gurên P.K.K ji rijîma Turkiyê re ye û li dijî zagona dewletan e , li dijî yekîtiya Îraqa federal a serbixwe ye , li dijî berjewendiya dewleta Turkiyê û gelên wê ye û ne li gor piştgirî û helwesta Turkiyê ji danezana serxwebûna Kosofo re ye jî .Tê xwestin Turkiyê dev ji vê êrişê di cî de berde û bi awakî aştiyane , demoqras û şaristanî bi pirsa Kurd re di Turkiyê de bide û bistîne . Komelgeya navnetewî û bi taybetî Emerîka û Îraqê divê bi rola xwe ya berpirsiyarî di derbareyî vê bûyera kambax û kirêt de rabin , ta ku , armanca me li jor aniye zimên pêk were . P.K.K jî pêwîste biryarine çarenûsî li gor demê û heyama heyî ji xebata xwe re bistîne , vegere di Turkiyê de xebata xwe bike , û tu asteng û girêkan ji vê bêtir ji Kurdistana azad re çêneke . Ji ber ku, dem ne dema çek û sîlehan û xwînrijandinê ye . Bervajî wê , heyama heyî ya zanîn , hişmendî , û dan û sitandinê ye . Û tev jî zanibin , raste ku , berjewandiya dewletan , helwest û siyaseta wan ji bûyeran avadike . Lê , divê ji bîr nekin jî ku , berjewendiyên wan jî netên parastin, eger bûyer , doz , û pirsgirêkên netew miletan çareser nebin .

www.arsivakurdi.org

***Eve, sergotara hejmara pêşî ji rojnameya KURDISTAN e, bi pênûsa Mîr Miqdad Midhet Bedirxan , di 22ê nîsana sala 1898an de hatiye nivîsandin.***

**Guhestina tîpan: Rêberê Silîvî**

# Bisimillah al rehman al rehîm

Sed hizar şikir û hemd ji Xwedê te,ala re em misilman xelq kirin û zanîna ilm û me,rifetê re hiş û zeka da me. Derheqa elimandina ilm û me,rifetê re gelik(gelek) ayetên celîle û ehadîsê şerîfe henin, dinyayê de çiqas misilman hebin, gund û bajarên hemiya de mekteb û medrese û cerîde henin, dinyayê de çi dibe çi nabe cerîde dinivîsin. Heyfa min têt ji Kurda re, Kurd ji gelik(gelek) qewma zêdetir xwedî hiş û zeka ne, camêr in, di binên xwe rast de û qewî ne, xurt in, û dîsa weke qewmên dî ne xwenda ne, ne dewlemend in, dinyayê de çi dibe, cîranê wan misqof çaweye, wê çi bike, nizanin. Lewma riya Xwedê de, min ev cerîdeya ha nivîsî, bi izna Xwedê te,ala paş niho her pazde roja de carekê ezê cerîdekê binivîsim. Navê vê min kiriye (**Kurdistan**), vê cerîdeyê de ezê behsa qenciya ilm û me,rifeta bikim, li kû derê mirov die,lime, li kû derê medrese û mektebên qenc hene, ezê nîşan Kurda bikim, li kû derê çi şer dibe, dewletên mezin çi dikin, çawe şer dikin, ticaret çawe dibe, ezê hemiya hikat bikim.

Heta niho kesî cerîdekî hole ne nivîsiye, ev cerîdeya min a ha, ya ewilî ye, lewma wê gelik kêmayî hebitin. Ez hêvî dikim kêmaya cerîdeyê ji min re binivîsin, hemî tişt wekî nû çêdibin kêm in, paşê hinkî diçe dikewe rê de, eve îdî ezê dest meqsedê bikim (we min ellahi al tewfîq

## Piştî 83 salan jî hê aşiqê hevdu ne

MÛŞ, 15/2 2008 — Duhî roja evîndaran bû. Li bajarê Mûşê yê bakurê Kurdistanê Sedîqe Çelikela 116-salî eve 83 sal e ko digel evîndarê xwe Mirad Çelikelê 107-salî dijî û duhî dema ko Mirad Çelikelî guleka evîndariyê da Sedîqeyê herdu çavên wê tejî bûn û got: Bila eşqa me bibe nimûne ji bo ciwanan. Sedîqe Çelikel û mêrê wê Mirad Çelikel li gundê Kapiliyê yê qezaya Korkutê ya Mûşê dijîn û heşt zarokên wan û li ser hev 150 nevî û nevîçîçirkên wan hene.



Ji bo îsbatkirina evîndariya xwe duhî bapîrê 107-salî Mirad Çelikelî guleka sor da dapîra 116-salî Sedîqeyê û got ew niho jî wekî roja pêşiyê ji xanima xwe hez dike. **Ji malpera Nefel hatiye girtin**

# Cejna Evînê, Li Hemî Evîdaran Pîroz Be

www.arsivakurdi.org

# Ahenga Dêrika Hemko

**Bi** helkeftina sala nû, rêxistina Dêrikê ya PARTIYA YEKÎTÎ YA Demoqrat a Kurd li Sûriyê (YEKÎTÎ) ,çavdêriya şevbiwêrkekê kir, ya ji bal koma Dêrika Hemko ya folklorî hatî li darxistin, di wê şevê de, Komela ciwanên Kurd hatibû vexwendin, û bi beşdariya hin girûpên çandî wek :

1-Girûpa çanda kurdî li Dêrikê .
2-Tevne çand û huner.
3-Saziya parastin û fêrkirina zimanê kurdî li Sûriyê.
4-Baxên jinên Dêrikê.

Bi jimarek baş ji keç û lawên Dêrikê, şevê dest pêkir, bi rawestanek bê deng li ser giyanê pakrewanên Kurd û Kurdistanê,di peyre bixêrhatina mêvanên şevê hate kirin û koma Dêrikê bi hin çalakiyan rabûn. Wek stirana (ez keçim keça Kurda me) bi dengê (Ahîn). Di peyre komela ciwanên kurd û seyranek di baxên helbesta kurdî de û helbestvan AZAD HEMO û hin helbestên xwe yên nazik û rind û pêre dengê bilûra bi axîn û bizqa delal û awazên naz û tenik şev hate xemlandin. Di peyre hunermendê hêja ISAM EBBAS , ji koma Dêrikê du stiranên xwe diyarî mêvanan kir. Ew jî strana (qamişlo) û strana ( tu li kû ma).

Hêjayî gotinê ye ku hin ji mêvanên şevê helbestin xwe pêşkêşî beşdaran kirin.Li dawiya ahengê, darêjkirina gato ji bal nûnerên girûpên çandî ve hate birîn û hin dan standin li ser helbestên AZAD hatin bikaranîn . Di peyre strana (ey lê gulê gula minê) bi dengê xortekî hate pêşkêşkirin.Raste şevek bû, lê ewê di bîranînan de geş û ronî bimîne.

Nûnerê weşana NEWROZ ev kurte hevpeyvîn bi hin ji beşdarên şevê re kir, ji wan:



1-M.Qasim: Sipasiyek bi rûmet. Raste çalakiyên bibin sedemên civîna mirovan ji bo dan û standinê ....hemû bi kizwetin û bi mifane.Nerîna min ewe ku ristevan 11 rist xwendin li dû hev me nikarî berbikevin. Hêviyên min gelekin lê ya sereke ewe ku miletê Kurd di sala nû de bi serkeve û li Sûriyê jî (lêvegera ) xwe avabike. Weşana NEWROZ weşanek cihê rêz û hurmetê ye ji ber birêveçûna wê ya bê rawestandin.

2-Evîn Şikakî:Silav û rêz, ez gelekî bi vê ahengê kêfxweş im û ev ne cara yekemîne ev xort û keçên hêja bi vî rengê buharî bi cih tînin. Ez destxweşya wan dikim û hêviya berdewamiyê û serkeftinê ji wan re dixwazim. Hêviya min ew e serkeftin û aştî ji kurdan re û çi kesê finda jiyaneke xweş ji xwe re pşêxiştibe, hêvîdar im ew find venemire. Li dawî hêviya serekeftinê ji weşana Newroz re dikim, daxwaza min yekdestiye di xizmeta toreya kurdî de ye.Sala we hemiyan pîroz be.

www.arsivakurd.org

# Du xalbalkêş di bîranîna Osman Sebrî (Apo) de

**Dr.Ebdilmecît Şêxo**

**B**eriya demekê bi bûneya bîranîna têkoşer Osman Sebrî min du berhemên hêca yên du nivîskarên jêhatî Siyamend Îbrahîm bi erebî û yê Reşoyê Pîrê bi kurdî xwendin. Herdu nivîs jî bi naverokên xwe dewlemend û nirx bilind bûn. Di vir de ez hezdikim du xalên giring yên ku li cem herdu berêzan hatine jibîrkirin zêde bikim. Mîna pir kes û nemaze herdu nivîskarên me yên jorîn dizanin ku, li dawiya 1998 an de "XELATA OSMAN SEBRÎ " bi beşdarbûna gelek rewşenbîr û siyasetmedarên Rojavayê Kurdistanê li Şamê hate damezrandin.



Komîta "Xelata Osman Sebrî " biryar istandibû ku her sê salan kesayetiyeke biyanî, yê ku bi berhem û helwestên xwe yên erênî, di dermafê gelê Kurd de hatiye naskirin, ji aliyê wê ve bête xelatkirin.

Li ser vê bingehê komîta "Xelata Osman Sebrî" xelata yekem wêna têkoşer Osman Sebrî di çarçûveke zêrîn û di bin navnîşana " JI BO DOSTANIYA GELAN ", di sala 2000 î de li Anqrê pêşkêşî zanyarê civaknasiyê yê mezin Prof. Îsmaîl Bêşikcî kir. Herwisa jî, di sala 2004 an de dayika Kurdan, rêzdar Daniyal Mîtran, xanima serokê Firansa yê berê Cak Şîrak li Însituta kurdî li Parîsê hate xelatkirin. Herweha wek em dizanin ku komîta jorîn niha xelata sêhem jî amede dike û dê wê di sala 2008 an de pêşkeşî kesaytiyeke Ereb û nasdar bike.Damezrandina "XELATA OSMAN SEBRÎ " beşek ji berdewamiya jiyana APO OSMAN SEBRÎ ye, ewa nirx û buhayê APO di nav gelê me û cîhanê de diçespîne. Lewra jî xaziya eva xala giring li nik nivîskarên me nehata jibîrkirin.

Xala duhem ev e, ku xêre pakrewanê Kurdistanê Osman Sebrî bi navê APO hati bû naskirin?

Li gor ku min ji devê nemir Hemreş Reşo yan ji devê rêzdar Prof.. Cemal Nebez bîhîstî ye, weha ye; Xanim Rewşen Bedirxan di hevdîtinên xwe bi Osman Sebrî re ji wî diprse; ma gelo ez çawa bang li te bikim? Eger ez ji te re bêjim Osman Axa tuyê ji min, vî navî nepejrînî? Vêca ez çi bêjim?

Osman Sebrî bersiva Rewşen Xanimê pir bi sanahî daye û gotî ye; hema bi min re bêje APO. Lewra, ji wê rojê ve ta niha serokê me yê nemir bi navê APO hatiye naskirin. Di vir de ez naxwazim şirove bikim ku ji bo çi ? Osman Sebrî nexwastiye bi navê Osman Axa bête bangkirin, lê di herhal de, eva helwesteke netewî û siyasî ye. Lewra, pêzanîna sedama bi navkirina Osman Sebrî bi APO jî, birek ji jiyana wî ya dewlemed û watedar e.

**Almaniya 14.02.2008**

www.arsivakurdi.org

# SÎNEMXAN
# Û RESMÊN RONAHIYÊ(*)


SÎNEMXAN
Û RESMÊN RONAHIYÊ

Hejmara Ronahiyê a didowan biderketi bû. Min jê çend nivîşt anî bûn mal. Çavê Sînemxanê pê ket û ji min pirsî:

— Bavo ev Hawar e an Ronahî ye?

Min got: keça min ev Ronahî ye, Hawara nû heta çend rojan wê derkeve.

— Ji kerema xwe ka yekê bide min.

Min nivîştek da-ê.Sînemxanê

Hejmara Ronahiyê a didowan biderketi bû. Min jê çend nivîşt anî bûn mal. Çavê **Sînemxanê** pê ket û ji min pirsî:

- Bavo ev Hawar e an Ronahî ye?.

Min got: Keça min ev Ronahî ye, Hawara nû heta çend rojan wê derkeve.

- Ji kerema xwe ka yekê bide min.

Min nivîştek da-ê. **Sînemxanê** Ronahiya xwe kire ber xwe û bi diqet li resimên wê temaşa kir. Piştî ko temaşa xwe qedand serê xwe hilda û gote min:

- Bavo! Ev Ronahî ne qenc e, a din jê çêtir bû.

Min got: Keça min, ji bervajî ve, ev Ronahî ji a din qenctir e, resimên wê bêtir in û bi tevayî ji a nivişta pêşin lihevhatîtir e. **Sînemxanê** li min vegerand û got: No bavo, ev Ronahî ne spehî ye. Resimên tê de hemî resimên apê ingilîz û eskerên apê Lêzgo ne-yanî firensiz- tu resimên kurdmancan tê de nînin . Di a din de resimên kurdmancan hebûn; kurdmanc direqisîn.

**Sînemxanê** hinek sekinî. Qey dida eqilê xwe û xuya dikir ko qîma xwe bi vê Ronahiyê ne dianî û hêj dilê xwe li min rahet ne kiri bû. Careke din serê xwe hilda û gote min:

- Bavo, ji boyî Hawarê gava em ji te dipirsin tu dibêjî: Ev Hawara kurdmancan e, ma Ronahî jî ne Ronahiya kurdmancan e?.

Ez kenîm û min lê vegerand û got: Belê **Sînemxan** xebera te ye. Lê tu dizanî ko dinya şer e û her tişt giran bûye, em nikarin ji nû ve klîşan bidin çêkirin. Bi klîşeyên hazir û berdest em bes dikin. Kanî resimên kurdmancan, ji xwe resimên kurdmancan li nik me nînin.

**Sînemxanê** nemerdî ne kirhema rabû çû û resimekî xwe digel **Cemşîd** anî û da destê min û got: Ev e ji te re resimekî kurdmancan, ma ez û **Cemşîd** em ne kurdmanc in?. **Cemşîdê** ko heta hingê têkilî ştexaliyê ne dibû gava navê xwe bihîst bêî ko bizane em qala çi dikin berê xwe da min û got:

- Belê bavo ez jî kurdmanc im; ez torinê mala Azîzan im.

Zarowan zora min biri bû. Min nizanî bû ez ji wan re çi bibêjim. Heq di destê wan de bû lê min ne dikarî bû ez daxwaza wan bînim cih. Min resimê wan kire kûrika xwe û berê xwe da çapxanê.

---

(*)-**Kovara RONAHÎ- Hejmar 3- Duşemb 1Hizêran1942- Rûpel 3- Bi pênûsa Mîr Celadet Bedirxan hatiye nivîsandin**

www.arsivakurd.org

# Serxwebûna Kosofo
# Rê li pêş xebata gelên bindest dûz û hêsandike

**-Xemxarê Kurdaxî -**

Li 17 . 2 . 2008 an , serokşalyarê kosofo Haşêm Tacî , li ser daxwaza gelê Alban ê Misilman , biryara serxwebûna Kosofo ji Sirbiya sitand . Hêjaye em bi bîr wînin ku, Encûmena parastina navnetewî ( Meclês el- emin elqewmî ), sala 1999 , biryara 1244 stand û li ber roniya wê biryarê, otonomiyek fere di hundir Sirbiya de , da kosofo . Ji xwe ew biryardana piştî gelek işkence , zehmetkêş û komkujiyên olî ku , dewleta Sirbiya bi serê xelkê Kosofo kirî hat .Piştî danezana serxwebûna Kosofo , 15 dewlet Ewropî mina : Firansa, Îtaliya , Isturaliya…….Emerîka , Kongira Islamî , Turkiyê , Birêtaniya û gelek dewletên dî , biryara erêkirin û piştgiriyê ji danezana serxwebûna Kosofo re dan û xuyakirin . Li aliyê din 6 dewlet Ewropî mîna Romaniya , Qubrus , Ispaniya , ……H.W.D , Rûsiya , Sîn…..rikberiya xwe jê re dan xuyan .Û hinên dî jî ta niha ne erê ne na mane . Piştî danezanê bi rojekê Prlemana Kosofo şalyarê dewleta Kosofo ya derve bi nav kir , û Yekîtiya ewropa jî berpirsiyrê xwe yê têkeliyên derve Xafiyêr Solane şand wir . Beligradê jî balyozên xwe ji hemî dewletên ku , ji serxwebûna Kosofo re erêkirine kişandin û dijîtiya xwe bi hemî çalakiyan ji serxwebûnê re diyarkirin.

Dijîtiya Bligradê ji serxwebûna Kosofo re ji me ve diyar e . Ji ber ku,Kosofo jê veqetî ye. Û dewletên din yê ku, jê re erê nekirine xuyadibe ku, li dij berjewendiya wan e û ji netewên ji nav xwe bi tirsin ku, bidin şopa Kosofo . Wek Ispaniya ji navça elpask bi tirs e , Rûsiya ji gelên Belqan di nav xwe de bi tirs e……..Lê , Turkiyê ji bona beşê Qubrisê yê Turkî erêkir , lê ne vehesî ye . Ji ber ku , dizane pirsek weha ( pirsa gelê Kurd ) li pêş wê ye jî .Yên ne erê ne ne jî , hîn di hêlekanê de wendayî ne , nizanin çi helwestê bistîninn .

Ji ber ku , em bi azadî û biratiya gelan bawer in , û em tekûzin ku , ev gav û nimûneyên mîna serxwebûna Kosofo , mînakinî ronak in wê rê li pêş azadiya gelên bindest dûz û hêsan bikin û xuya dibe wê herin serî jî . Vêca em xwe li rex helwesta erê ji serxwebûna Kosofo re dibînin . Û em hêvî dikin ku , rojên li pêş wê ên azadî , aştî , û wekheviya gelan bin .

## Heval Ebdil-mecîd ji nav me barkir

**Di** 19 -02-2008 an de, heval Ebdil-mecîd Remo Silêman, ji gundê Îska, herêma Kudaxê, çû ser dilovaniya xwe. Heval Ebidil-mecîd, di sala 1949 an de ji dayîk dibe û di sala 1980î de, derbasî nav refê partî dibe. Ji wê demê ve û ta dawiya jiyana xwe bi dil û can di nav gel de dixebite. Lwere jî, di nav gel de bi navê **Xalo** dihate nasîn. Li ser gorna wî hevalekî gotina partiya wî pêşkêş kir û li ser xebat û sinciyên wê rawestî.



Bi navê komîta rêvebir ya belavoka Newrzê, em serê xwedî, gundiyên Îska û hevalên wî saxdikin.

www.arsivakurdi.org

# Wateya Cejna Evînê Çî ye?.

***Dîlan Zivingî***

**Di** dîroka her dewlet û gelên cîhanê de , bûne û rojên taybetmend hene , hin ji wan weke cejn û boneyên cîhanî têne diyar kirin mînak : Cejna Jinan , cejna Karkeran , cejna Zarokan , cejna Sersalê û W.K.D . Li ev çend salên dawîn, rûdawa cejna Evînê weke cejnke cîhanî hewş vedide û bi renkegî fermî ji hêla dewlet û civaka Sûriyê ve tête pîroz kirin . Ma gelo ... ; Bingeha vê çêrokê çî ye? Ji kû ve hatiye ?. Weke cêrok û dîroka wê nîşan didin , ev bûyer a gelê Romaîn ye. Di dîroka Romaiyan a kevnar de hersal di -15-ê Sibatê(Fibirayêr) de , ji bo xwedayên jinê((xono)) , zewicî , Sirûştê((Puno)) vestîval lidadixistin û qurban dikirin ! Emperetorê Romanî (Kilîniyas) fermanekê di dema şer û cengan de derdixe û zewaca evîndaran qedexe dike !. Bi nêrîn û baweriya Emperator ku zewac ziyanê li mêran dike û wan pir hejar û bê hêz dihêle. Vêca jî , ew di ceng û şeran de bi ser nakevin. Li raberî vê fermanê Elqdîs Felentîn radiweste, li dijî zordariya Emperetor alîkariya xelkê dike, pir mirazan dighîne hevdu û pir dewat û şahiyan pîroz dike. Li encama vê yekê, Emperetor fermana giritna (Felentîn) dide û wî davêje binê hepis û zîndanan. Felentînê me, di hepsê de ji keça qerdiyanê hepsê , ya ji herdu çavan ve kûr bû hezdike. Dîwar û sînorên olî diçirîne û bi evîndara xwe re dizewice ?!. Piştî zewacê herdu çavên keçikê vedibin û ew derdora xwe baş û xwaşik dibîne. Emperetor fermana darvekirina Felentîn dide . Ew ji berî darvekirinê , namakê ji evîndara xwe re dinivîse û imza xwe li bin dixe . Piştire Felentîn di -14-ê Sibatê de sala -270-an berî zayînê tê ye bidarvekirin. Lewre jî, Baba (Cilesîs) biryarê dide ku , roja -14-ê Sibatê ,roja darvebûna felentîn , li şûna -15-ê Sibatê ji bo bîranîna qidîs felentîn bibe cejna Evînê û hersal, ew roj bi gul û diyariyên curbecur û nemaze yên sor were Pîroz kirin. Wisan jî îro Felentîn li seranserî cîhanê bûye simbola evînê. Bi vê bûneyê zor girînge ku, em weke neteweke bindest, di vê warî de dewilemend û zengîn bin. Pir bûyer û serpêhtî di dîroka Kevin û nû di civaka me de hene, weke nimûne : Di sala -2007-an de , Dua ew keça ciwan a -17-salî li kastîna Şengalê bi hovîtî û regekî ne mirovane bi keviran wê dikujin. Ma gelo..; Gunehê wê çi bû?. Tenê li mafê xwe - weke keçik-xwedî derket û ji xortekî misilman û Kurd hezkir. ! Zor mixabin ku tevî em di sedsala bîst û yekan de ne , hêjî civaka me di bin gerdîşên pûç û vala de dinale. Xuyaye , zagona civakî di ser hemû zagon û pêvajokên demê re ne. Her weha ciqas pêwîste, em hersal di vê rojê de , li ser babetên ji vê rengî, di riya partî ,rêxistin û tevgera kurdî re û di nava civaka xwe de şirofe bikin . Belikîm em karibin bi vê awî hin asteng û pirsgirêkan kêm û ko bikin, rê li pêş jiyanike wekhevî , aştî , demquras ji nifşên nûgiha re dûz bibe . Lê dawî , rêz û silav li giyanê hemû evîndarên ku negihan mirazên xwe û ew bûne qurban .

www.arsivakurdi.org

**Dumahîk : Ahenga Dêrika Hemko**

3-Hêminê Mindanî: Ev şev li nik min wek destpêka karekî nuh û bi şiyan e lewma ew cihê rêz û rewazê ye di gel astengiyan û pîlanên xerab ji hemî aliyên jiyanê, ji layê zordarên Kurdan. Sala 2007an, ne gorî hêviyan bû, lehî û zevîhejînan pir qurbanî û zirarmend li paş xwe hiştin û ji layê rejîmê ve, pir guvişk û tengavî derbarê gelê Sûriyê bi giştî û gelê Kurd bi taybetî bi karanîn. Ez dibînim sala 2008an wê baştir be, lê ez guman nakim ku wê li gor tê xwestin be. Bi hêvî me tevgera Kurd li gor hêviya miletê xwe be.

4-Ednan Beşîr: Ev şevek gelek baş û germ bû, van qîz û xortan ji me re li darxistin, bi rastî ne şevek normal bû. Helbest hinekî dirêj bûn,bi hêvî me miletê me, welatê me bikeve xêr û xweşiyê. Ya din, daxwza me ew e ku weşana Newroz bibe heyva ne, ji ber ku ew weşanek hêja ye.

5-Hozana Mîro: Rastî şevek gelek xweş bû, em pê gelekî kêfxweş bûn. Bi rastî helbest hinekî dirêj bûn. Xwezî çalakîn din hebana. hêviya min, sala nû xêr û xweşiyê bi ser miletê me de bênê, rêz û hurmeta min ji weşana Newroz re, bi rastî, ew weşanek zengîn û hêja ye.)6- Ednan Çaço: Evokat: Şevek gelek xweş e, bi rastî ciyê rêz û hurmrtê ye, helbestvan hinekî dirêj kir, lê dengê bilûr û bizqê ew sarî şikand, rêz û hurmeta min ji weşana Newroz re, em bi hêvî ne serkeftin li pêş wê be. Hêvî û omîda min ji sala nû, ku miletê me di warekî xweş de jiyana xwe derbas bike, û ya giring hêviya min ewe ku lêvegera kurdî ava bibe, ji bo doza kurdî li sûriyê cihê xwe yê durst bistîne .



Weşana Newroz sipasiyên xwe pêşkêşî hemî beşdaran dike, bi hêviya ku sala nû, sala azadî, wekhevî û demokrasiyê be.

*Nûnerê weşana:NEWROZ.(Dêrik)*

**Têbînî:**

Ji bo çalakî û arîkariya **Komîta Dicle ya fêrkirin û parastina zimanê kurdî li Cizîrê** bi weşana me re, Desteya rêvebir a NEWROZ, sipasiyên xwe pêşkêşî wê dike, pêşketin, berdewamî û serkeftinê jê re dixwaze.

## Enstîtuya Kurdî li Kölnê gavek e dîrokî avêt: Kurdên cîhanê bi rêya internetê ferî kurdî dikin

Enstîtuya Kurdî li Kölnê piştî amadekariyên dirêj, ji bo fêrkirina tevayê Kurdan li Cîhanê bi riya internetê kursa fêrkirina zimanê kurdî vedike. Kurs pêşî bi zaravayê kurmancî dest pê dike. Diyalektên din jî di rê de ne. Enstîtu dê tevayê bersivên xwendevanên zimanê kurdî yekser, bi riya internet anjî telefonê bide.

Li gorî zaniyariyên ji rêvebirya enstîtuyê hatiye girtin, kurs 26 ê sibatê saet 21.30 î dest pê dike. Mamosteyê kursê Fêrgîn Melêk Aykoç e. Kurs rojên Sêşem, Çarçem û Pêncşembê dê bête dayîn.

Zarathustra News - Ev navnîşana e-peyamê li hember spam bot'an tê parastin, ji bo dîtinê divê Javascript vekirî be

www.arsivakurdi.org

**Dumahîk :Sûriyê û Roja....**

Ragihandina fermî digel hinde dezgehên dewleta Sûriyê bi hêrs û şewat li ser pirsa bikaranîna zimanê Erebî radiwestîn, didane pê , dikirine hawar û qîr ku zor pêwîste û divê xelkê Ereb karibe hê bêtir li zimanê xwe yê dê bibe xwedî , û vaye – xwedêgiravî – rêxistina Yonisko ya navnetewî roja 21ê Subatê bona giringiya vê yekê kiriye rojeke cîhanî, loma jî divê hemî navend , komele û dezgehên Sûriyê li zimanê erebî miqate bin .

Ne xeme mirov karibe bîne bîra xwe, ji ber ku hêjayî gotin û dubarekirinê ye ku, li Sûriyê li dirêjahiya 50 salên borî , gelek biryarên aşkere û yên veşartî li dijî bikaranîna zimanê me yê dê derçûne û hatine bikaranînin . Rol û kartêkirina wan biryarên qedexekirina zimanê me yê dê – Kurdî – hê berdewam û li dar in . Eve ne tenê nakokiyeke mezine , lê belê rûreşiya siyaseta şoven û toximperestî bi xwe ye .

Zanyarê hêja Mîr Celadet bedirxan ji berî bêtirî 70ê salî destê xwe dabû ser birînê , giringî û pêwîstiya zimanê dê baş naskiribû , bi dil û can jê re xebitîbû , di ber de şerekî mezin dikir , xwe pir pê mijûl kiribû , dida ser hev , dida ber hev , diponijî û dinivîsî . Ji nivîsarên nemir Celadet nameyeke vekirî ji Mistefa Kemal re bona zimanê kurdî bû , îro jî bo me Kurdan hêjaye mirov lê vegere , da ku em jî weke civat , rêxistin , weşan û kes li Sûriyê karibin hê bêtir li zimanê xwe yê dê bibine xwedî û hersal bi hatina roja 21ê Subatê re silavên germ ji Yonisko re biînin .

**Sînorê Yekta**.

**Dumahîk :Danezana Şamê**

Ne tenê weha jî , mixabin tenê yên Ereb girtî hîştin . Bi wê jî nekirin , peyê xwe şandin û otombîlên ên mîna Semîr Neşar û Mihemed Hecî Derwîş şikandin û ava esîtê bi ser de reşandin . Daxwazên wan ji ve pêlanê pir çûkan bi kevirekî bêxin li alikî , tirs û cirfandinekê bixin dilên endamên Danezanê . Li aliyê din ziyanê bigihînin berjewendiyên kesên sebixwe . Û li aliyê din jî , kêmbawerî bikeve nav Ereb û Kurdan .

Gava dudiyê , şer û rûreşkirina Danezanê bi her awî li pêş xelkê Sûriyê , çi di riya ragiyandinê an jî di riya peya û hêzên ewlekariyê yên xwe re . Mîna girêdana Danezanê bi drve yên ne dost bi Sûriyê re û bi taybetî Emerîka re.Gunehkirina Danezanê bi gurkirina quretaiya netewan û bi taybetî netewa Kurd li Sûriyê, û nepiştgiriya hêzên bexwedanker li hember Israîl ,…..û H.W.D .

Gava sisiyê , hewildanek din jî belkîm hebe û di paşerojê de xuya bibe, ew jî hurutandina hin kes û hêzan ku, Danezan û pilatformine din avabikin . Da ku, bi zanebûn an bê zanebûn di xizmet armancên wan Kevin . Û Danezana Şamê jar bikeve , û hêzên wê ji ber hev bi dûrkevin.

Raste tiştê Rijîma Sûriyê kirî û dike ziyanê digihîne xebat û çalakiyên Ragiyandina Şamê . Lê , divê em ji bîr nekin jî ku, li alîkî din jî ev ton karên qirêj sûde jî gihande wê . Ji alîkî ve xebat û çalakiyên wê ji dûr û nêzîk re berbiçavkir , ji aliyê din ve piştgir û dostên wê li hundir û derve zêdekir, û ji alîkî din ve jî herdiçe baweriya pirekan ji endamên Danezanê bi vê xebata demoqras û pîroz di hundir Sûriyê de zêde û geşd be , û bêtir bi hev ve têne girêdan .

Li ber vê roniyê , em bawerin ne tenê îro, sibe jî , û heya bi heya , çareserkirina hemî pirsgirêkên di vî welatî de , bi danûstandin û guftûgoyên demoqras û şaristanî , wê çareserbibin . Dibe hin caran velukume û raweste , lê divê dev jê neyê berdan û em jê venegerin . Ji ber ku , berjewendiya hemî gelên Sûriyê û bi taybetî yê gelê Kurd di wê riyê re pêk tê

**Memê Alan**

www.arsivakurdi.org

# Danezana Şamê
# li ber gef gurên man û nemanê

Ji berê û paşê ve , tirsa mezin ya rijîma Sûriyê ya awerte , rêzder, û nebiservehatî, ji danûstandin û lihevkirina di navêna hêzên niştîmanî yên rikber û bi taybetî yên Kurd û Ereb de ye. Vêca ew bi her awî hewil dike ku, her biçe bawerî di navêna wan de nemîne , û kend, bend û dîwar werin avakirin . Ji ber ku, ew dibîne çiqas gel û hêzên wê yên niştimanî û demoqras li Sûriyê ji hev ve nêzîk bibin , ewqas temenê wê kin dibe , û ziyan digihêje berjewendiyên wê .

Piştî lidarxistina Encûmena niştimanî ya Danezana Şamê li 2 ê Berçile 2007an , bi beşdariya 166 kesan ji nûnerên hêz û partiyên pişikdar û kesên serbixwe yên demoqras çi Ereb , Kurd , Asur , demoqras, lîbral, olperest û netewî , bi awaki rêk û pêk û serkeftî li orta paytextê , herweha seknandina beşdaran li ser hemî pirsgirêkan bi awakî demoqras û şaristanî, û standina gelek biryaran di pir waran de , ji guhertina demokras ve bigir , di çareserkirina pirsa kurdî bi şêwakî dadmend re derbas be ,……….û H.W.D . Paşê jî , avakirina qelafeta Danezanê , hilbijartina komîta serokatiyê ji pênc kesan û heftdeh kesan ji Emanê elamê re , û li dawiyê ristin û rawekirina daxuyana dawîneya civatê . Ev karê he ku , cara yekê di dîroka Sûriyê de , di nav rikbera wê de , û di hundir de tê kirin , girîze û tirsek berda govdeya rijîma Sûriyê .Û wê hîşt ku, vecinîqe û li ber vê xebat û çalakiya pîroz ya Danezanê ( Ragiyandina Şam – Îlan Dîmeşq ) bisekine û rawest e. Ka wê çawa û bi çi awî kanibe Danezanê weke Buhara Şamê ( Rebîi Dîmeşq ) ya 2001an, pûç bike û ji hev bişelîne?.

Gava yekê bi biryardana elemin elqewmî , di riya şaxa emin dewlê re , di yek wextê de , li seranserî parêzgeh û herêmên welêt , dest bi pêla girtinê kir . Bi dehan endamên beşdarî civata encûmenê bûne hatin girtin , û jêpisînên cubecur ji wan hatin kirin. Da ku, bizanibin rewşa civtê çi bû û kî bûn kesên lê beşdar? . Hin ji girtiyan di cî de berdan , hinên dî ( 24 ) katan li cem xwe hîştin , û hinek jî bernedan . Dûre bi wê tenê nekirin , pêla girtinê berdewam kirin , lê vê care di mofirkên serekîn de bû . Wek, Dr . Fîdai Ekrem Horanî , Riyad Sêf , Dr. Ehmed Tu,imê , Mamoste Ekrem el- Bunî , Elî Elebdele, Mihemed Hecî Derwîş ,, şêwekar Telal ebû Dan , ….û H.W,D , ta niha hejmar gihaye 13 an . Li vê dawiyê ew bi jarkirina hesta Erebperestiyê û gurkirina kurdperestiyê li Sûriyê gunehkarkirin û dane dadgehê. **D.R ( 11 )**

***Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê me yê Kurd re yên di girtîgehên Sûriyê de***

www.arsivakurdi.org